

Jîn

Jimara sê

Heyva Temuzê 2006

Vercinye, Emrîke

perê - 1




Ji berî heft sala ez çûme mala hevalêt xu yê Kurd da şivê bixwim. Wan pîza peperonî kirrî bî u me pêkve xwar. Piştî me nîva pîza xwar, êk ji zelama peperonî nîşa min da u pisîara min kir ku ew çî ye. Wextê min gute wî ku ew goştê berazî, ew ‘ecêbgirtî ma. Ez bawer dikim wî bawer kir ku ew tematêt hîşik yan tiştekan dî bit.

Hindek cara hevalêt min yê Kurd pisîara min dikan, “Buçî Mesîhî goştê berazî dixwin?” Pisîareka baş e. Ev dursa he ya mêjuê u ew çîroka li pera sê bersiva wan pisîara dit.

Mêjua Xwarina Goştî

Li dest pêkê Xwidê li roja pêncê balinde, masî u gîanewerê avê çêkirin, u li roja şeşê gîanewerê kehî u gîanewerê li ser zikî diçin u gîanewerê çûlê çêkirin. U ew hemî baş bîn. Xwidê jî li roja şeşê Adem u Hêwa çêkirin u li beheştekan li Rojhelat “Eden” dana dinav da. Her dû miruv u gîanewer gîaxwar bîn – bes keskatî u fêqî, tov, u dexil dixwarin. Bu nêzikî 1650 sala kesê goşt ne xwar. Piştî hîngê di demê pêxemberê Nuhî da, Xwidê hemî ‘edîr, miruv, gîanewer u balinde bi reşe avekê (feyezanekê) mezin xeniqand çunku xirabîa miruva tijî dilê wî peşemanî.



Bes Nuhî u heft miruvê mala wî u dû ji her gîanewerê u balindê (u heft ji her gîanewerê yê qurbana) zindî man.

Piştî hîngê Xwidê gut Nuhî u mala wî ku ew dişen her goştê bixwin. Belê pêtivî ye ew goşte bê xwîn bit.


Piştî nêzikî 300 sala, Îbrahîm pêxember Xwidê da. U piştî nêzikî 800 salê dî, Xwidê desturê xu bu miruva dane Musa pêxember. Ev desture xwarina goştê yê miruva gîrdan kirin – xwarina goştê pêtivî ji gîanewerê “paqij” bî. U ji vî demî u pê ve goştê gîanewerê “pîs” ne hêlaî ye.

“Gîanewerê paqij” eve ne:

- (1) gîanewer kabka xu kelşî dibit u xwarna benîştê xu yê cî (wekî bizina)
- (2) masî yê şaper u qilişk hebin (wekî masîê rîbarî)
- (3) hindek balinde (wekî mirîşka)
- (4) kêzik bi çeng u her dû pê u ji destê wî dirêj bin u xupê dihilavêjin (wekî kûlîa).



“Gîanewerê pîs” hemî gîanewerê dî (wek kêvirîşk, şêr, rîvî, beraz, hêştir, hesp, qirrş, hît, kêvilaje, seqer, qirr, u mar).



Piştî 1000 sala, Xwidê ‘Îsayê Mesîhî pêxember bu ‘erdê hinart. Piştî mirin, veşartin, u rabûna ‘Îsayê, êk ji hevalêt wî yê ‘ezîz, navê wî Petrus bî, xewnekê “gîanewerê pîs” dît. (Çîroka temam li ser perê sê bixwîne.) Li xewnê Xwidê gutê ku goştê hemî gîanewera bixwît, u goştê gîanewerê pîs jî bixwît.

U ji ber hindê em dişên pîza peperonî bixwîn.



Azadîa rastî çî ye?

Me axiftinekê Inglîzîê heye: “Ewê bi şîrî dijît, bi şîrî dê mirit.” U ew jî rast e:

Ewê bi desturê dijît dê bi desturê ête dad kirin.

Ûemîa wijdanekê hey. Wijdan Xwidê yê dilê me da nivîsî. Me jî desturê Xwidê ji destê Musa pêxember li ser kitêba nivîsîn yê hey.

Da asayîş li welatê me yê azadî hebit, dadwer destura dirist dikin da hev welat bizanin ku çî dirist e u çî ne dirist e. Behira pitir ji desturê welatê me baş in. Belê ji ber miruv divêt leşê xu razî bikin, ew jî desturê xirab çêdikin yan dihêlin.

Bu nimûne li Emrîke hêlal e heker jinek biçîk ji ber xu bibit. Belê bi destura Xwidê ew kuştin e. Li ‘Îraq – ji ber berpîrsîarî ya desturê kême – hindêk miruv hizara hizar dular (yê hatin dan bu pêşkeftina ‘Îraqê) bu xu hildigirin u nadine hejara bi dirist. Bi destura Xwidê jî ew dizî ye.

Ew kesê li dîv desturê Xwidê ne çin gunnehkar in. Ew miruve divêt biêne dîar kirin ku li ser desturê çin u nav dilê xu da ne wesan in, u eve dûrîatî ye. Bi çavê Xwidê, her dû gunnehkar in u dû rî xirab in. Ez nimûnekê dê dime we piçekê qehire, belê li ser babetê min e.

Li komela Kurdî ‘edetekê hey dibêjit jinek pêtivî ye kiç bit roja şîkîrnê. Ew ‘edete baş e u berê xu desturê Xwidê da ku pêtivî ye miruv xu ji dehmenpîsî dîr bêxit. Bu nimûne kiçek hebî u bu roja şîkîrnê ew ne kiç bî (çunku kesekê dest drêjî li ser namîsa wê kir bî), u ji ber ‘edetê mala wan babê wê kuşt. Belê ji ber babê wê jî ne kesekî dirist bî li gel jina xu, ew dû rî ye. Pêkhatî li gel desturê Xwidê ew gunnehkar e u pêtivî ye ew jî biête kuştin.

Belkî tu dibêjî, “Ma çî ye? Kî dê zanit heker zelum

ne paqij e?” Heker ew desturê we ye, ew jî bi destê miruvê ye u ne bi destê Xwidê ye, çunku Xwidê hêmi miruv ji desturê êk dad dîkit. Bi çavê Xwidê, miruv miruv in, yan nêr yan mê, u pêtivî ye hêmi miruv ji dehmenpîsa dîr bit.

Evê bizane: heker tu u komela we bi desturê dijîn, hîn dê ji vê desturê dê êne dad kirin.

Ewê li jêr çakîa Xwidê dijît dê bi çakîê Xwidê ête dad kirin.

Hêmi tişt yê hêlal e, belê hêmi tişt ne yê bi mifabî ye. Hêmi tişt yê hêlal e, belê hêmi tişt ava naket.

Xwidê bi dadperwer e u bi diluvanî ye u jî bi çakî ye. Li dumahîkê jîanê, her miruv dê ête dadkirna Xwidê bu dû tişt: (1) yan bawerîa wî bi Xwidê pêkhatî li gel ser rêka Xwidê bikit u (2) jîana wî li ser ‘erdê çawa ye.

U nuke bila nimûna li pêşîê sehîkînê u kiçê u babê wê bi çakîê dad bikîn pêş desturê ve.

Li kiçê bila bibure u biparêze. Ji ber dest drêjî li ser namîsa wê hat bî kirin – ne bi destê wê bî – ew ne kiçek bî roja şîkirna xu. Zavaê wê bila hêjê bikit u qebîl kit. Babê wê bi taybetî bila hêjê bikit u qebîl kit çunku ew kiça wî ye u çunku ew (u te’idaî) bi xu her dû gunnehbar in u dehmenpîs in. Bila ew dû zelum pêtivî ye ji gunnehê xu bizivirine ve u bila pêtivî ye nîşa kiç u kurrêt xu bikin çawa her dem bimînin paqij. U bila em jî li babê u te’idaî ker biburîn u qebîl bikîn çunku em jî gunneh dikîn.

Me divêtin bi azadîê bijîn. Bila azadîê neke armanc da leşê xu razî bike, belê pêşve bibîne xulam di xizmeta êk u dû da bîn. Hindî desture hêmi diête lêkdan di êk şîretê da: “Tu çawa hêş ji xu dikî wesa hêş ji nêzikêtu xu jî bike.”

Jur ve yê danaî rê nîşanderê devê wî ye, u pê wî hêza bawerî pêkîrnê tundtir lê dîkit. ... Tiştêk nîne biête di leşê miruvî da ji der ve u miruvî pîs dîkit, belê ew tiştê ji miruvî derkevin miruvî pîs dikin ... çunku di nav da, ji dilê miruva, hizir u kirîarîet xirab derdikevin. Ev tiştê xirab hemî jinav miruvî derdikevin u miruvî pîs dikin.

- ji axiftina pêxemberê Silêman u ‘Îsayê Mesîh

Kurnîlûs u Petrus

Zelamek hebî li bajêrê Qeyserîê navê wî Kurnîlûs bî, serukê sed leşkera ji hêza Îtalîa bî. Ew u hemî binemala wî ji Xwidê tirs bîn, gelek çakî digel xelkê pêdivî dikirin u her dem nivêj dikirin. U rojekê nêzîkî demjimêr sê piştî nîvru xewnek dît. U firîştê Xwidê bi aşkirayî dît di hate def u gutê, “Ey Kurnîlûs! Nivêj u xêrê te bu bîrhatinê bilind bîne beramber Xwidê u vê gavê hindek zelama bihinêre bajêrê Yafa u gazî ke Sem’anê navdar bi Petrusî. Ewê akincî li def Sem’anê çerim çêker yê ku mala wî li def derîaê.” Demê firîşte digel diaxift çû, Kurnîlûsî gazî kire dû ji xulamê xû u serbazekê ji Xwidê tirsê herdem digel. U ewî hemî tiştê çêbîn gutine wan u hinartine Yafa.

U di roja paştir da demjimêr nehê rojê, demê her sê zelum nêjîk ji bajêrê Yafa dibîn, Petrus çû ser banî da nivêjê bikit. Îna dil girtî bi u dît esmanê vekirî ye wek amanekê mezin ji perokîa şor bî ye erdê girêdaî ji her çar kujîet wê. U yê tijî bî ji hemî corêt gîanewerêt li ser erdî bi rê ve diçin u balindêt esmana u drinda u ewê li ser zikî diçin. Îna dengekî gutê: “Rabe Petrus, vekuje u bixol!” Belê Petrusî bersiv da, “Ne Xudan, min çî cara tiştê pîs u hêram ne xwarî ne.” Îna dengî careka dî gutê, “Ew tiştê Xwidê paqij kirî ne bêje ve esmana. Petrus ji ber ramana wê



© Bible Visuals

yê pîs e.” U ev tiştê sê cara hate dûbarekirin u ew aman vegeña dîtina dîtî guhişî u di wî demî da ew zelumê Kurnîlûs hinartî pirsîar li mala Sem’anê çerim çêker dikir u di derî da rawestan. U pirsîar kir, “Erê Sem’anê bernîas bi Petrus li vêrê ye?” U di wî demî da hêş Petrusî di ramana wê dîtine da, hizir dikir. Îna Gîanê Pîruz gutê, “Sê zelum yê li hivîa te. Vêca rabe u herre xwarê li def wan u digel wan herre u xû dudil neke, çunku min ew yê virêkirîn.”

U paşî Petrusî ew zelum gazî kirne mala xû da bibine mêhvanê wî u li roja paştir Petrus digel wan da çû u hindek bira ji Yafa digel da bîn. U li roja paştir gehîştine Qeyserîê u Kurnîlûs li çaverîa wan bî u ewî miruv u hevalê xû yê nêzîk daxaz kirbîn. Demê Petrus bi jur ketî Kurnîlûs xû çemande ber pê wî. Îna Petrusî rakire ve u gutê, “Rabe ez miruvek im wekî te!” Paşî Petrus bi jur keft ew digel diaxivî, îna xelkekê mezin dît u gute wan, “Hîn dizanin ku hêram e li ser Cuhî dan u standinê digel bîanî bikit yan jî li mala wî seredana wî bikit, belê Xwidê ya nîşa min daî ku ez çî cara ne bêjime êkî tu yê pîs î yan jî hêram î. U ji ber wê çendê ez yê bi dilê xû hatîm da daxaza we bi cih bînim, vêca ez dişem bizanim buçî we ez daxaz kirim?” Kurnîlûsî bersiv da, u behsa xewna xû kir. Vêca di cih da min hinarte dîf te ra u te baş kir tu hatî u em hemî nuke diamadeî ne li beramber Xwidê da me guh li wan destura bit ewê Xudanî gutine te.”

Îna Petrusî dest bi axiftinê kir u gut, “Bu min bi diristî ya dîar bî ku Xwidê kesê bi ser kesê naexit. Belê ji hemî milleta dê wî kesî wergirit

ewê jê ditirsit u karê rast bikit. Tu dizanî ew nama Xwidê bu xelkê Îsraîlê firêkirî mezgînîa aşîê digehînit bi rêka ‘Îsayê Mesîhî Xudanê hemîa u we ya zanî hemî tiştê li devera Yehudîê çêbîn li despêkê li Celîlê bî piştî jêravkirnê ewa Yuhennaî pê gazî dikir. Xwidê ‘Îsayê Nasirî bi Gîana Pîruz u bi hêzê run kir, u ew ji cihekî diçû cihekî u çakî dikirin u ew hemî sax dikirin ewê Iblîsî êxistinê bin hêza xû, çunku Xwidê digel bî. U em li ser wan hemî kirîarîet, li devera Cuhîa u Urşelîmê pê rabî şahdîn, ku ew bi kuştî bi darekê ve hatbî helawîstin. Eve Xwidê li roja sê rakire ve we lê kir ku dîarbit ne bî hemî xelkî belê bi tinê bu wan şahdê Xwidê berî hîngî jê girtî. Ewê me digel xwarî u vexwarî piştî rabîna wî ji nav mirîa. Wî destur da me em mizgînîê bi wî bidîne xelkê xû u şehdeîê didîn, ku ewe yê Xwidê dadwer bu mirîa u saxa nîşan kirî. Hemî pêxember bu wî şehdekîê didin u her kesê bawerîê bi navê wî bînit dê lêburîna gunneha bi navê wî wergirit.”

U demê Petrusî diaxiftin Kurnîlûs u hemî heval u xulamê wî bawerî ‘Îsayê Mesîhî kir u pesina Xwidê dikir. Îna Petrusî destur da ku ew bi navê ‘Îsayê Mesîhî jê av bikin. U paşî Kurnîlûs daxaz ji Petrusî kir ku li def wan çend rojeka bimînit. Demê hevalê Petrusî yê Cuhî li Urşelîmê guh li vê çendê bî, pesina Xwidê kir u gutin: “Vêca Xwidê peşemanî ya daye Netewa (miruv yê ne Cuhî ne) jî da jîanê wergirin.”

- Karê Hinartîya 10:1-3, 4b-9, 10b-20, 23-29, 33-44a, 11:18b

Îmêlêt We

☞ Silav bo te jî.

Ji bo jimare ya nû ez gelekî sipas dikim. Ez hîvîdarim gelek babetên reng u reng, em govare te dewlemendtir bibîn.

Min cend îmêlên hevalêt xwe bo te virêkir. Ez hîvî dikim te govare xwe bo wan ji rê kirî ye.

Serkeftin bo te dixwazim ji karên te da.

S.

☞ Bi navê Xwidayê mezin,

Silav u rêz min bu te hene.

Ez supasiya te dikim heker tu îmêla xoşka Amîra bu min binhêrî. Weku min zanî ku tu u Amîra pêk ve bîn li Kurdistanê, ez qotabî bîm def Amîrayê. We em fêrî zimanê Inglîzî dikirîn.

Heker ez ne xelet bim navê te Şîrîn e.

Z.

☞ Şîrîn

Cuantirîn u nêziktirîn rêz u silava ji Dihuka rengîn dikeme dîyarî bo mamostaya xwe ya hêja (Şîrîn) ê...

Li despêkê ez quantirîn, pîrozbahîa li te dikem u destxweşî li karê te yê mezin dikem. Bi rastî govareka gelek cuan e u ya bi mifa ye u hemî babetên wê gelek di xweş in. Dixwazim ya berdewam bî li ser karê xwe u ya serkeftî bî u hemî şîyanên xwe bi Mesîhî di xizmeta gelê me da.

Dê bêjime mamosta xwe (di xizmedame bo belafkirna govare “Jîn” li ser hevalan).

Di gel rêz u silavêt min bo hemê hevalan.

Hefalê hewe,

Z.N.D.

☞ Şîrîn...

Ez zor supas ya te dikem bu vê name. Bibore heta nuke îmêla te te nekirî ye çunku eve demeke dor were min îmêl ne kirî ye. Le to careka dî bu min zor supas virêke.

P.S.Z.

Berîkana Wênêkêşanê

Tu dişêî wênê dirist bikî bi qelemê reş yan heker te êk hebit bu me îmêl bike: jeenuazadi@cs.com. U pêtivî ye gehet di destê me ne drêngtir ji 25ê mehê.

Êk ji van babeta hilbijêre:

- çîrokê li ser ma li perra êkê
- ‘edet u keltur yêt Kurdî yêt kevin
- ‘edet u keltur yêt Kurdî yêt nî

Em dê sehkînê wan wêna u dê brîarê dîn ka kîşk wêna êkê ye, yê dûê ye, u yê sîê ye, u dê ew wêne belav kirin li guvarê da.

Dîtina Peyvêt Kurdî

Tu zanî ez Emrîkî me. Bu min Behdînî zimanekê bîanî ye. U ez zimanê ‘Erebî nizanîm. Demê ez Behdînî fêr bîm (1992-1993), di axiftina we da hindek peyvêt ‘Erebî hebîn. Nuke me divêt bê peyvêt ‘Erebî biaxivîn u binvîsîn.

Vêca heker te divêt harî karîa min bikî da ez peyvêt Kurdî dirist bizanîm, zehmet ne bit îmêlekê bu min virêke **jeenuazadi@cs.com** u peyvêt Kurdî bu min binvîse. U ristekê jî binvîse da ez baş tê bigehim.

[(Ar) = Arabic / ‘Erebî; (K) = Behdini Kurdish / Behdînî; (f) = feminine noun; (m) = masculine noun]

Bu nimûne: **car** seyare (f) (Ar) (seyara min *my car*)

Heker tu peyvekê Kurdî ya dirist bizanî, îmêlekê bu min virêke u husa binvîse. (Heker tu ne şêî nimûnekê bi Inglîzî binvîsî, çi nîne. Nimûnekê bi Behdînî pêtivîtir e.)

car = seyare (f) (Ar) = timbêl (K)
 timbêl (Timbêla min kesik e. *My car is green.*)

Supas bu harî karîa we!

Demê tu îmêla min dikî, zehmet ç = c,
ne bit bi pîtêt Kurdî NE nivîse ş = s,
çunku wextê digehite kimpûtera ê = e[^]
min, پیتت کردی digehin ÆİĀĬÇ î = i[^]
u ez ne şêm bixwînim. ħ = h[^]
Çêtir e pîtêt taybetî husa binvîsî: x̄ = x[^]

ball tepik (Ar) (f) (Min tepik havêt. *I threw the ball.*)

barber shop dikana ħelaqî (Ar)

bargain (v) te’amil kirin, te’amilê bike (Ar)
 (Ez dê te’amilê li gel xudanê dikanê kim.
I will bargain with the store keeper.)

basement serdav (f) (Ar)

beauty salon salun (Ar) (f)

beige bêcî (Ar) (m)

carpenter necar (Ar) (m)

carport terim (f) (Ar) (Ezê li bin termê rînim.
I’m sitting under the carport.)

clan ‘eşîret (f) (Ar)

conscientious zemîre (Ar) (Zemîre heye. *She’s conscientious.*)

crash (v) de’mîn, bide’mê (Ar) (Heyva neh seyara min de’mî. *My car crashed / was in an accident in September.*)

cube mike’eb (Ar) (f)

cubicle mike’eb (Ar)

examination (1) imtîhan (f) (Ar) [written or oral exam] (Min imtîhan hebî. *I had a test [in school].*)
 (2) feĥîs (f) (Ar) [medical exam] (da feĥîsa min bikî *in order to have an exam*) (feĥîsa xwînê *blood test*)
 (3) mi’yene (f) [medical exam] (Dixtur mi’yena mi kir. *The doctor gave me an exam.*)

exercise (v) rîaze kirin, rîazî bike (Ar) (Ez temrînêt rîazî dikim da ez ze’îf bibim. *I’m exercising so I’ll get thin.*)

Father’s Day ‘îd li ab (Ar)



God willing Enşallah (Ar)

governate miĥafeze (f) (Ar)

ice cream dondirme (Ar) (f) (Biçîkêt min ĥes ji dondirmê dîkin. *My kids like ice cream.*)



































ingredients meqadîr (Ar) (Çi ye meqadîr kêke?
What are the ingredients in cake?)

Animals



A crossword puzzle grid with 65 numbered starting points. The grid is filled with empty squares for letters. Some squares are pre-filled with letters: 1 (O), 2 (W), 3 (L), 48 (D), 49 (O), 50 (G).

Elif Bê

'	‘Îraq		I, I	Istralîe		S, s	sister	
A, a	agir		Î, î	îprax		Ş, ş	şeh	
B, b	berx		J, j	jjî		T, t	temate	
C, c	camî		K, k	kiras		U, u	Urdin	
Ç, ç	çav		L, l	leymîn		Û, û	ûtêl	
D, d	dersuk		M, m	meymînk		V, v	vexwarin	
E, e	enişk		N, n	nubedar		W, w	werîs	
Ê, ê	êxtîar		O, o	ode		X, x	xîar	
F, f	fêqî		P, p	paîsigil		Û, ù	ûarîfk	
G, g	gul		Q, q	qelew		Y, y	Yunan	
H, h	heyv		R, r	rîvî		Z, z	zirrna	
Û, ù	ûêstir							

Deyk u Biçîkêt Wê

Ev wêne dirist kirin ji laê wêneçêkerekê ji bajêrê Zaxo, Kurdistana Îraqê, 1993.

